

Teyrê xerîb: Mahmut Baksî

Min û wî cara pêşî bi rêya telefonê qise kiribû. Di xeta telefonê de bixêrhatina min kiribû, û deriyê mala xwe ji min re vekiribû.

Roja hevdîtinê, heyecanek bi wate cendek û rûhê min rapêcabû. Dîtina nivîskarê nasdar Mahmut Baksî ji xwe cihê kêfxweşiyê bû. Lê heyecana hevpeyvîna bi rojnamevanekî profesyonel re, rengê xwe guhertî ye.

Rojnamevaniya min li welêt bi salan domandibû. Li derveyî welêt jî çend sal in bi xurtî didomiya. Baksî jî weke rojnamevan bi gelek kesên nasdar li cîhanê hevpeyvîn pêk anîbûç qise kiribû. Lê vê carê rol hatibûn guhertin. Ez mêvanî wî bûm û wî dê bersiva pirsên min bida.

Dema wê hatibû ku, mutewazîbûn, rêzgirtin, hilbijartina peyv û pirsan û bersivê bijarte û hizirkirina kur, rol lîstin û hunera rojnamevaniyê xwe bide der...

Min ji taxa "Odenplan"ê, ji kolana "Dala"yê xwe berda ber bi "Svea"yê. Berê min li kolana "Surbrun"ê bû. Rê, bi meşê, 20 deqîqe dikşîne...

Ji erd û ezmanan berf dibariya. Bayê hênik, bi gulokên berfê re mîna ku di ber kilamek klasîk de, bi nazî dîlanê bikşînin, bi rîtmek nerm li ezmên dizîvirin, beşek dabin ramûsan û li ser hinarkan datanîn û yên din jî dibûn kulîlkên spî û şaxêñ daran şînspî dikirin. Kolanêñ Stockholmê bi xelîçeyêñ spî dihatin raxistin, rengek guhertî didane xwezayê.

Li Surbrunê nêzî bînahiyekî çend tebeqe dibûm û bi derencan ve hildikişim. Kûmê xwe ji serê xwe dikim, hewa sermayê ser xwe dihavêjim û derketina min ber bi jor ve xurtir dibe. Ez nêzîkî mala wî dibim. Ji hundir bi dengek xweş kilamek kurdî bilind dibe:

*"Ax... heywax li min, heywax li min... lê mala minê
Heyfa dilê min mehkûmê, min rebenê lê dil ketinê
Ehmedê Mala Mûsa çawa mi dixwazî lê mi nadînê
Hûnê çawa bikûjin xweşmêra ji bo xatirê mi rebenê xweşik jinê
Heywax li min heywax li min mala minê
Heyfa çavêr reş û belek hûn dibînin iro ax ketinê..."*

Baksî derî vedike. Bixêrhatina germ, raxistina mutfeq û eywanê û bêhna xwarinêñ Kurdî mirov bi xwe re dibe Kurdistanê. Em derbasî eywanê dabin. Ew, berê xwe dide mutfaqê û qehwe datîne ser êgir, di ber re distirîne. Deng/bêjiya Baksî têra xwe bala min dikşîne.

Min zanîbû ku ew nexweş e. Ji nêz ve bala xwe didimê, çavêr wî çûne xwarê. Kîloyêñ wî kêm bûne. Derket holê ku, nexweşiyêñ giran jî rê li ber evîndariya rojnamevaniyê negirtiye. Wî nivîsên min ji nêz ve dişopand, û hayê wî ji Medîa Kurdî û nivîsên belav dabin têra xwe hebû. Me biryar da ku, bi bêhna fireh hevpeyvînê bikin. Bersivêñ wî, bi ken û helwêsta wî ya germ

dest pê kir. Nêzîkbûna wî, cemedâ heye ji holê rakir û eywan germ kir û resmiyet li derve ma. Hevpevîna me cihê xwe dida sohbetê dostane...

Qehwe ji me re hat. Xanim Elin, anku hevala wî bi xêr hatina min kir. Ew jî rûdine û sohbata germ berdewam dike.

Elin Clason nivîskar û rojnamevanek nasdar e. Wê hejmarek pirtûk li ser Kurdan nivîsî ye.

Wisa dibêje Elin:

“Min Mahmut Baksî nas nekiriba, Doza Kurdan dê çi caran nebûna mijar ji xebatê min re. Enerjiya Baksî, hezkirin û girêdana wî bi welatê wî ve, min zinditir dike. Mahmut bû sedem ku, em bi hev re xebatê film û mûzîkê bikin. Herin serdana Kurdistanê, bibin mîvanê şervanê Kurdan, serokên Kurdan Talebanî û Qasemlo bibînin, xebatê xwe bîhêjînin hetanî Qamişlo. Belê, 23 salê min yê rojnamevaniyê bi giştî doza Kurd hemêz dike...”

Sohbet û hevpeyvîn têkilav bûbû. Min carna kaseta teybê didate rawestandin. Mijara sohbetê bûbû dengbêjên kurdan. Kûrbûna wî li ser çanda Kurdî, evîna wî li hemberî kilamên klasîk û dengbêjên Kurdistanê xwe dida der. Ji her kilamekî rîzek dihanî zimên. Dengbêj Baksî bala çi kesan nekişandibû. Qet qala aliyê wî yê dengbêjiyê nehatibû kirin...

Berê hevpeyvînê dikeve ser pirsgirêkên mediayê. Exlaq û pîvanên etîkî. Û pirsgirêkên Rojnamevaniya Kurdî. Gazinê wî li ser mijara *“sansûra rêvebirê organên mediayê li hemberî xebatkarên xwe û li ser navê rexnegiriyê nêzîkbûnên bi neyartî”*, bi rêz dibûn. Agir ji awirêne wî dibariyan û wisa digot: *“Pêwîst e em berê rexneyê bidin rojnamevaniya xwe û paşê pêñûsêñ xwe bikin tiving û bixine sînga mirovan!”*

Paşê *“dostêñ roja teng”* bû mijara sohbeta me. Gazin ji xwe kir. Ji dost û nasêñ nêz kir. Dirêj bû gazinê wî. Tev bi keser, hêvî û carna jî bi nifirêne eşkere barkirî bûn. Diyar bû ku, hêviyên wî ji wan pir hebû. Di dema şerê wî li hemberî nexweşiyênen xwe de hejmarek kesêñ bi sînor li nik xwe didît...

Hevpeyvîna dirêj, bûbû sê beş. Beşek jê belav bû yên din di arşîva taybetî de ma...

☒☒☒

Me gelek caran hev dît. Hevpeyvînê rojnamevaniyê cihê xwe dabû, serdan û sohbetê kesêñ nêz.

Cara dawî, hevdîtina me li mala wî ya nû li Gotgatanê pêk hat. Wî qala suprîzekê ji min re kiribû. Dema ez çûm mala wî, bi Ehmed Kaya re bixêrhatina min kir. Li mala nû Elin xuyanî nedikir. Lê dengê heman kilamê ya li kolana Surbrunê, ji mutfaqê belav dibû. Min baş fêhm kir ku Baksî, pir hez ji vê kilamê dike:

*“Ax.. dayê Ehmedê Mala Mûsa çi xweşmîr e, hunermend e lê, tembûrvan e
Tesbîhê di destê wî de ji kevrê şadî, lê ji kehreban e
Ew mîrxasê xweşmîra nekuje bi Xwedê ezê bêjim:*

Ew e mîrê bi sed mîran e

Ew nemerdê Ehmedê min bikuje hawar ew ji bera gur û rovî lê xayina ne

Ax.. dayê pêre hatî cejn û îda vê Qurbanê

Keçik û kurikeye me derketin govend, şahî lê vê dîlanê...

Salihê pismamê min bang kir got:

Te por kurê Ehmedê Mala Mûsa birîndar e li aliyê le... di eywanê..."

Êşa sirgonê giran e. Hesreta welat û dûrmayîna ji evînê, dost û xizman, weke agir e, di dilê mirovî de ye, dişewitîne, agir û bêhna şewatê ji dev, çav û mîjiyê mirovî difûrîne. Mirov di binê bîrek kûr û nîvcikîyayî de ye. Bi bîrê re diçike. Her car bi hêviyên mezin bi dîwêr ve hildikişe. Di nîvê rî de, dest diweste, mîjî naxebite û tempoya dil qels dibe. Mirov ji ezmana bi ser dev dikeve erdê. Cendek perçe perçe dibe. Êşa bêhêvîtiyê mirovî kor dike...

Mahmut Baksî û Ehmed Kaya du teyrîn xerîb û evîndarê welatê xwe bûn. Evîna welatperweriyê jiyana li sirgonê dabû wan. Jiyana sirgonê bi nexweşîyan barkirî ye, û weke ku Mehmed Uzun dibêje: “*mirin herdem dikare bibe mîvanê mirovî*”...

Min li Baksî û Kaya nerî. Bi dilek şikestî, nifirêñ min birêz dibûn:

“Çend demin ez nifiran dikim xêr nake û dua dikim nagihêje cî. Cihê nifir lê dihatin pejirandin, çima ji me re bêdeng e?! Çima dengê me nabe xwe?! Çima em, zarokêñ Zerdeşt û Brehîm pêxember, herdem dibine qûrban?! Çima hêstirêñ me nayêne dîtin, qêrîniyêñ bav û dayikêñ Kurdan re guh tê girtin!?”

Em bi hev re derbasî odeya xebatê dibin. Makîneya kevnare ya nivîsînê li ser masê ye. Li wir, li ser dîwan û ber pacê tev nivîs, jêretebînî, rojname, pirtûk û dokument in. Nivîs û dokumentêñ li odê şahidbûna gelek bûyerên li Kurdistanê dikin...

Baksî ji me re qala eşqa xwe ya pêşî dike. Evîndariya wî didomiya. Yara şêrîn ji bîra wî nedîçû. Pora dirêj, çavêñ xezal, bejina zirav, lêva sêvesor ji hiş û xeyala wî dernediket. Ji me re qala yara şêrîn dikir:

Ne bi dilekî lê bi heft dilan dil ketibû keçek xwîn şêrîn. Awirêñ wê, wî serxweş dikir. Baksî biryara xwe dabû ku pê re bizewice. Wî zeriya di xeyala xwe de peyde kiribû. Yadîgarî diçûn û dihatin. Nîvsozek hatibû birrîn.

Hêrsbûna wê rojê, biryara şaş û çend peyv bûbûn sedema têkçûyîna wê zewacê. Çû û nebû yar jê re. Çend sal di ser buyerê re derbas bûbûn. Keçik bi kesekî din re zewicî bû. Zarokêñ wê çêbûbûn. Lê dilê Baksî hê jî bi ser wê ve bû. Agirê dilê wî gurr dibû, û şewata wê didomiya...

Dema Baksî derketibû Ewropayê, nivîskarên Kurdan li Ewropayê zêde tune bûn. Wî ji bo parastina çand û zimanê kurdî gelek berhem afirandin. Bi rêya pirtûkên wî, çîrokên kurdî li dinyayê belav bûn.

Rojnamevan bû, derd û xwestinê gelê Kurd anî zimên. Carna jî bi rola dîplomasiyê radibû, derdê welatê me dihanî zimên. Îro jî aliyê wî yê film û muzîkê li benda lêkolînê ye, zêde nehatiye qalkirin.

Ew, rojnamevanek durbîn, zûbîn û kurbîn bû. Buyerêr rojane ku ji xelkê re normal dihate ditîn, li bêjingê dixist û jê re dibû mijara nivîsinê. Rengek pir profesyonel dida nivîsan. Bi peyvîn hilbijartî û kurdewariyê nivîsên xwe ava dikir û bi rengek balkêş pêşkêşî mirovan dikir. Têkiliyê wî xurt û piralî bûn. Diwestiya, lê enerjiya rojnamevniyê jê re dibû hêzek nû...

☒☒☒

Evîndarê ziman û çanda Kurdî Mahmut Baksî nexweşıya xwe giran bûbû. Paşê xebera nexweş belav bû. Mahmut Baksî çûbû rehmetê...

Ji bo cara dawî,
Xatir jê dihate xwestin,
Kurdên li sirgonê yek bi yek,
Mîrhem Yigit, Mehmed Uzun û yên din,
Paşê hevala wî Elîn,
Silav didanê de.

“Min li Amedê bi cî bikin”, gotibû Baksî,
Û ew,
Li devera ku Şêx Seîd û bi sedan şervanên Kurdan serî dabûn,
Cihê ku ji Kurdan re bûbû K`abe,
Bi beşdarbûna bi hezaran kesan,
Li Amedê dihate bi cî kirin.

Ew niha ji navenda kurdewariyê li me temaşe dike,
Êdî ne êşa sirgonê dikşîne û ne jî ya nexweşiyê,
Bi tevayê şehîdên welat re ye,
Bi wan re silavê dide me,
Û dengê kilama li ber dilê wî şêrîn pêl bi pêl tê,
Ji bedena Amedê bilind dibe û dighêje dost û kesên nêz:

“...
Gava ez çûm mi bi çavê serê xwe dî, hawar e dayê...
Dilê min şewitî lê agir danê

*Heywax li min heywax li min mala minê
Heyfa çavê reş û belek dibînin hawar, ax ketinê...*

Amadekar: Gabar Çiyan

Endamê Komîteya Karge ya
Navenda Kurdocide Watch-CHAK ê &
Edîtorê EuroKurd News ê